

DEREWÎN

Sê kurê Gozê hebûn. Navê yê mezin Tîtal, navê yê ortê Sûto, navê yê biç'ûk Nadir bû.

Hersê jî derewîn bûn. Gava gilî dihate ser derewê wan, Gozê ha digot:

- Derewê Tîtal p'ya diçin, derewê Sûto dir'evin, derewê Nadir dîwarava hildik'sin.